

# Rûmeta şehîdên LGBTI+ yên ku dilê wan bi hezkirineke bêhempa ve tije bu

ALBÛMEK JI BO BÎRANÎNA HEVRÊYÊN  
DI TÊKOŞÎNA ŞOREŞGERÎ YA ÇEKDARÎ DE NEMIR BÛNE









# Pêşgotin

Ne ku bêqisûr û bê tirs bûn. Xwe keşif kirin, evîndar bûn, xeletî kirin, ketin lê rabûn, şer kirin, dil şikandin, dilê wan hat şikandin, kenîyan, giriyan, li pey daxwazên xwe ketin, ketin depresyonê, bi dînbûn li ber herkesî, dibe ku bi dizî anjî eşkere reqîsîn. Ew jî wek her kesî mirov bûn.

Di heman demê de tişta ku wan ji hev cuda kir, sekna wan ya li dijî faşîzm, emperyalîzm, kapîtalîzm, feodalîzm, bavîksalarî û her cure paşverûye, tevî hemû dorpêçên heteroseksîzm û bavîksalarî bû. Ev cesaret, helbet ji berxwe ve derneket. Di encama şert û mercên civakî û hişmendîya wan a geşbûyî de bûne parçeyek ji têkoşîna şoreşgerî. Hawara wan ji dinyayê re hevzayend ne tirsonek in bû. Ew li Stonewall bûne molotofek karkerên seksê yê trans û rêyên ku em dimeşîyan ronî kirin. Li tevahî cîhanê destkeftiyên tevgera LGBTI+ kirin gule û li şarjorên xwe dagirtin.

Helbet zehmetî dîtin, helbet dudilî jîyan kirin. Pê ve girêdayî hîn bûn ku ji vê hatiye dayîn nerazî bin û bi gotina, "Eger yek ji me ne azad be, em hemû jî girtî ne." ezeziye ku pergale ferz dike perçe kirin. Di vê belgeya ku di destê we de ye, kurteçîrokên hejmareke pir kêma lehengên LGBTI+ yê ku beşek ji şerê çekdarî ne, ku me karîbû navên wan ji dorpêça heteroseksîst a bavîksalarî derxînin, hene. Berî wan û piştî wan jî gelek hebûn ku em navê wan nizanin. Ji niha û pê ve ji bo ku tu şervanên LGBTI+ veşarî nemînin, em di nav dîrokê de notekê dinîvisin. Helbet ev not wê bigihîje girseyên LGBTI+ yê ku ji antîpropagandaya li dijî şoreş û şoreşgeran bandor bûne.

Em baş dizanin ku destkeftiyên demokratîk ên LGBTI+yan heta ku bigehêje şoreşê wê mayînde bibin. Emperyalîst û sermayedar her firsend dest datînin û mafên me distînin. Li ser me ferz dikin ku em bibin parçeyek ji paytexta pembe ji bo "azadiyê" û bibin parçeyek ji nîzama heteroseksîst. Berjewendiyên me yê rojane me li dijî pergale tîne cem hev. Ev kombûn carna bi destkeftî û carna jî bi binketin bi encam dibe. Lê belê mijara sereke ew e ku van kombûnan veguherînin rêxistinekê û ber bi pêşerojê ve bibin. Berjewendiya me ya dîrokî, ji gundên Afganîstanê heta metropolên Ewropayê, bi şoreş û şerê şoreşgerî yê ku wê bi xwe re bîne, gengaz e. Ev ê li erdnîgariyên cûda û di demên cûda de di bin şert û mercên wan ên bêhempa de çêbibe. Lê divê li ser pîvanên bingeîn be. Yê ku ji bo berjewendiyên rojane pêşeroja tevgera me ya azadiyê bi "diltêya baş" xistine xeterê hene. Li hembere rewşek wiha, Sylvia axaftina xwe ya navdar dema ku karkerên seksê yê trans ji ber fikarên exlaqî û normatîf ji tevgerê hatin derxistin, kir. Rêxistinên şoreşger ên ku paşeroja şoreşê dixin xeterê, girseyên LGBTI+ di bin rehmeta emperyalîzm û kapîtalîzmê de hiştine, bêtî ku encamên mezin ên din bihesibînin hebûn. LGBTI+ yê ku ji bo xwe biparêzin tercîh dikirin di balonan de bijîn hebûn. Lê ev hemû hatine şikandin û şikandine berdewam e. Helîn Qereçox yek ji wan kesan bû ku bi vegera Rojava ev yek guherand.

Niha ala wan a li dijî LGBTI+fobiya bi ramanên şoreşgerî yê li dijî oportunîzmê dihejîne û serhildana me geş dike. Careke din em soza xwe dubare dikin ku em ê rêyên ku wan bi çemê şoreşê ronî kirine bicivin da ku berxwedan û îrade bibe serketin.

Pêşerojek azad li pêşîya me ye ku em bi vê biryardariyê bi ser bikevin. Û niha em nikarin ji wan re bêjin mirî, ji ber ku ji bo kesên ku dilên xwe bi evîna nayê pênase kirin tije dikin mirin ji wan re nîne!

**TKP-ML Yekîtiya Jinên Komunîst (KKK)**





# Willem "Tiky" Arondeus

22.08.1894 – 01.07.1943

Willem di 1894 de li Naarden ya Hollanda ji dayik bû. Di xortaniya xwe de bi malbata xwe re li ser homoseksueliya xwe niqaş kir û di encamê de di 17 saliya xwe de ji mala malbata xwe derket . Diçû dibistana hunerî û paşê wek hunermend kar kir. Wek hunermendekî di warê aborî de zehmetî kişand . Wî çend pirtûk , çi çîrokî û çi jî ne-çîrokî, ji bo dahata xwe temam bike , nivîsandiye ku serketî bû û rewşa wî ya aborî çêtir kir. Willem di serdemek ku ev yek pir neasayî û xeternak bû, tewra di derdorên civakî yên liberal û hunerî de ji di derbarê zayendiya xwe de vekirî ye.

Despêke di karbenda xwe de, ew beşek ji civatek hunerî li Hollanda Bakur bû, di vê serdemê de gelek karên hunerî afirand û piraniya jiyana û ramanên xwe di rojnivîskan de pelikand . Rojnivîsên wî balkêş in ji ber ku wî li ser hevzayendiyê di dem û cîhek ku belgeyên hindik ên paşerojên hevzayendan hebûn nivîsî. Nivîsarên wî di heman demê de derbirinên bêbaweriya li ser homoseksueliya wî û nezelaliya li ser hewes û armanca wî ya jiyana jî hene . Tê gotin ku Willem Arondeus têdikoşe ku zanibe armanca wî di jiyana de çi ye, qet ne bawer e ku ew bi rastî aîdî wî ye an ew li cîhê rast e. Bi qase ku tê dîtin wî tiştê ku lê digere nedît, gelek caran koç kir, demekê li Parîsê ma, lê piştî ku gihîştê wê encamê ku Parîs ne ya ku wî hêvî dikir , vegeriya Hollanda.

Dema ku nazîstên Alman di sala 1940 de Hollanda dagir kirin , hema hema yekser tevî berxwedanê bû . Heval û rêhevalên wî ya berxwedana , Willmekî ku bi awayekî bêhempa ji bo dozê ve girêdayî ye û bêewlehiyên wî yên berê ji ber azwerî û hezkirina wî ya ji mirovan re hatiye paşguhkirin nîşan dide . Xuya ye ku armanca xwe ya jiyana di xebata berxwedanê de dîtiye û piraniya tirsên xwe li pey xwe hiştiye.

Di sala 1942an de kovareke binerd a bi navê " Brandarisbrief " derxist û tê de bang li hevalên xwe yên hunermend kir ku li dijî hêzên dagirker bisekinin . Ev kovar di sala 1943 de Willem , bi nasîna Gerrit van der Veen ve De Vrije Kunstenaar (Hunermendê Azad) re hate yek kirin û ev weşan heya dawiya şer di sala 1945 de berdewam kir. Bi saya hevdîtina wî ya bi Gerrit re, ew bi Frieda Belinfante re jî di çalakiyên sextekirina nasnameya Yahudîyan de cih girt. Dema ku sertîfkaya mecbûrî ji Yahudîyan re hate danîn , wî tavlê xetereyên wê yên potansiyel nirxand û li dijî wê kampanya meşand û di demekê wisa de ku pir hindik kes wiya dikiribûn . Ji ber vê yekê beşdarbûna di vê lêkolînê de ji bo wî pêngavek mentiqî bû.

Wekî ku di gotara li ser Frieda Belinfante de hate gotin, sextekirina nasnameyan her ku diçû kêmtir bi bandor dibû, ji ber ku ew dikarin li hember belgeyên di Serjimariyê de werin kontrol kirin û wekî sexte werin destnîşankirin.



## "BILA WERE ZANÎN KU HEVZAYEND WEK PÊNASEYÊ NE TIRSONEK IN"

Ji bo berevajîkirina vê yekê, Willem, Frieda û yên din ên ku bi wan re dixebitin, planek derxistin ku ofisa tomarkirina nifûsê li Amsterdamê, ku belgeyên nasnameyên gelek Cihûyan tê de dihatin parastin û ji bo naskirin, tacîzkirin û dersînorkirina wan dihatin bikaranîn. Wan difikirî ku heke tomar winda bibin, Nazî nema dikarin wan kontrol bikin. Û bi vî awayî wan erka xwe di sala 1943 de dest pê kir. Çalakiyên sabotajê bi serketî bûn, qeydên serjimartinê, di nav de zêdetirî 800,000 nasname, bi tevahî hatin rûxandin, û gelek jiyan hatin rizgar kirin. Lê piştî çalakiyê demek kin gelek endamên komê ji ber xayînekî nenas hatin girtin. Di dema lêpîrsînan de, Willem red kir ku tîmê mayî eşkere bike, lê lênûskek aîdê wî hate dîtin û pîraniya komê bi her awayî hate girtin. Willem li sûcê xwe mikur hat û hemû sûc girt; belkî ev alîkarî kir ku her du endamên din ên ciwan ên komê ji darvekirinê rizgar bibin. Gelek, di nav de Willem, hatin darizandin û cezayê darvekirinê li wan birîn.

Koma ku piştî şer bombebaran pêk anî, balkeşe ku navê komê bi navê Gerrit van der Veen, zilamekî hetero yê na-trans, ku di heman demê de beşek ji komê bû lê ji Willem Arondeus zêdetir rêbertiya komê nekir, bû. Lê ji bo gelê Hollandî yê wê demê, zilamek heteroseksuel wekî serokê grûpek berxwedanê ya çekdar belkî ji zilamek hevzayend wekî serok bi hêsanî hêsantir hate pejirandin. Di komê de tê îdiakirin ku du endamên hevzayend ên din jî hene, Bakker û Brouwer, lê agahî li ser wan kême. Willem Arondeus bi dehansal kême-zêde di nav dîrokê de bûye.

Piştî mirina xwe heta sala 1984an ji ber xebata xwe madalyayek nehate xelatkirin. Li aliyê din Gerrit van der Veen di sala 1946'an de ji ber berxwedana xwe piştî mirina xwe madalyaya rûmetê wergirt û navê wî li dibistan û kolanekê hate dayin. Nasnameya zayendî jî di vê derengketina naskirina xebatên Willem de rol dilîze.

Gotinên dawî yên Willem bi gelemperî wekî "Bila were zanîn ku hevzayend ne tirsonek in" têne binav kirin, lê wergerek rasttir ji gotinên wî yên orîjînal dê dibêje "Bila were zanîn ku hevzayend wek pênaseyê ne tirsonek in". Dibe ku ya berê di civata îroyîn de ji berxwedêrek wek peyamek geştir û jêhatîtir xuya bike, lê nabe ku em gotinên wî li gorî çarçoweya xwe ya heyî biguhezînin. Di şûna wê de, divê em gotinên wî bi rûmet û fam bikin ku ew di dem û çarçoweya xwe de pir radîkal bû. Beşek ji têkoşîna kesên LGBTI+ bû, wî ew têkoşîn pêş xist û bi saya wî û gelek kesên din têkoşîna LGBTI+ ji dema wî zêdetir pêşket.



# Amelio Robles Avila

03.11.1889 - 07.12.1984

Amelio wekî Amelia di 1889 de li Xochipala, Guerrero, Meksîkayê ji dayik bû. Kurê malbateke cotkar, cotkaran wekî çinek di şoreşa Meksîkî de rolek girîng lîstin. Wî piraniya zaroktiya xwe li cotkariyê, dûrî bajêr derbas kir, li wir jî derfeta fêrbûna hesp û çekan hebû. Da ku ew wekî keçek hate dîtin, ew li civatek katolik a bi navê Hijas de María hate tomar kirin. Wî xwest ku bibe doktor, ku di wê demê de wekî karê zilamek dihat dîtin. Di sala 1912 an jî 1913' an de tevî gerîla dibe û li wir "hesta tam azadbûnê" dibîne. Ev rewş berevajî jiyana wê ya wekî keçek li cotkariyê bû. Piştî ku tevî şer bû, wê hîlbijart ku ji mê zêdetir nêranî xuya bike, û ji hingê ve ew ê heta dawiya jiyana xwe wekî Amelio were zanîn. Jêhatina wî ya bi hesp û çekan wî di nav refên gerîla de bi nirx û bi hurmet kir. Amelio ne ji aliya birdozî, ji hezkirina jiyana gerîlatiyê tevî Zapatîstayan bû. Ev jiyana ji bo wî guncav bû, nêranîtiya wî kêr û zêde dihat qebûl kirin, jêhatî û kesayetiyê wî dihat qîmetkirin, ji azadî û zehmetiyên vê jiyana hez dikir.

Robles di dema xwe ya nêzî şeş salan de bi Zapatîsta re beşdarî gelek şeran bû. Tecrûbeya wî ya bi hesp û çekan re dibe alîkar ku ew bigihîje pileya albay. Pevçûna wî ya herî navdar şerê 1914 li Chilpancingo bû, ku têkçûna

Huertismo û serkeftina Zapatismo li Guerrero nîşan da. Di vê pevçûnê de, wî gelek birînên çekan wergirtin, ku paşê wî hez kir ku nîşanê her kesê ku guhdarî bike.

Guhertina îfadeya zayendî ne hêsan bû, qebûl kirina nasnameyên cuda yên zayendî di tevgera Zapatîsta de ne hevpar bû.

Homofobî bi taybetî di nav tevgerê de xurt bû û encamên cidî ji bo hin endamên hevzayend, wek Manuel Palafox, hebûn. Hebûna Palafox ji aliyê yek ji fermandarên gerîla Maurilio Mejía ve hat înkarkirin û got, "Şeytanekî belengaz ê mîna te nikare xwe hevalê zilamên rast mîna me bi nav bike." Eşkere ye ku di çarçoveya şer de, hevzayendî wekî jinbûnek hate dîtin û ji ber vê yekê li dijî nirxên şoreşgerî yên nêranî yên wê demê ye. Heman mantiq di heman demê de cîhê nisbeten azad afirand û hişt ku Amelia bibe Amelio, ji ber ku Amelio bi rengekî mînak bû di hilgirtina nasnameya nêrane de ku di şer de ew qas hêja bû.

Her çiqas dem bi dem bû mijara henekan ji nêranîtiya wî bi giştî dihat qebûl kirin. Hevalên wî bi êşkere rêz ji mêraniya wî digirtin, lê bi taybetî jê re digotin "la coronela Amelia Robles", mîralay jin Amelia Robles. Wî wan mecbur kir ku nasnameya xwe qebûl bikin û bi zorê da qebûl kirin. Cîranek di hevpeyvînekê de got, "Min qet gazî wê nekir xanim, min her dem jê re digot Mîrza Robles, ji ber ku kesek jê re bêje jin an xanim, wê çeka xwe bikişîne." Amelio dabeşkirina zayenda bavîksalarî ya dema xwe qebûl kir. Ew veguherî zilamekî maço ku li hemberî gefan yekser û bi tundî tevdiqerîya û cesaret û hêz nîşan da. Di têkiliyên xwe yên bi jinan re, di civakê de rolên qalibên mêran bi cih anî; Mînak, wî tu carî karê malê nedikir û di jiyana xwe de bi giranî xwe dispêre jinan.

Amelio Robles ji bo xwe û hem jî ji bo gelê xwe şer kir. Wî mêranîtiya xwe di demên cuda de nîşan da û di tevahiya jiyana xwe de bi bawerî û serbilindî hilgirt, di vî warî de pêşeng bû. Di heman demê de, pejiwandina wî ya rola zilamek welatekî tîpîk encama dema wî bû.

Ew ji nakokiyên ku îro jî hêla zilamê trans an jî tevgera mêraniya trans ve têne meşandin bê agahdarî dijiya û di sala 1984-an de nemir bû. Lê di nava tevgera azadiyê de mîraseke giranbuha hişt.







# Frieda Belinfante

10.05.1904 – 05.03.1995

Frieda di sala 1904 de li Amsterdam , Hollanda ji dayik bû. Ji ber ku bavê wê piyanîst bû û bi muzîkê re mezin bû bû sedem ku li ser vê rêyê bimeşe. Di azebîya xwe de dest bi lêdana çelloyê kiriye, bi taybetî piştî ku bavê wê di sala 1924an de ji ber nexweşiyê jiyane xwe ji dest da, ji ber ku rewşa wê ya aborî zehmet bûye, bi awayekî profesyonelîst dest bi vî karî kiriye ji bo ku alîkariya aborî bide malbata xwe. Ji biçûkatiya xwe de, bi karaktera xwe ya xurt, bêhempa û biryardariya xwe dihate naskirin . Weke jîneke ciwan di dema şer û serdestiya mêr de mezin bû, serxwebûna xwe girt û ne li bendê bû ku kes bide wê. Lezbiyenbûn ji bo wê ne mijara niqaşê bû, wê bi xwebaweriyek bêdeng cinsiyeta xwe hilgirt. Wê tu şerm, guman, an tevlihevî li ser wê hîs nekir , lê ji ber vê yekê evîna xwe bi îddî dişopand û li gorî wextê wan veşartî dihişt . Di 17 saliya xwe de cara yekem rastî sextekariya belgeyan ceriband . Wî belgeyên rêwîtiyê sexte kir , da ku hevalek dibistanê bikaribe ji Hollandayê dekeve û vegere cem hevjinê xwe yê li Yekîtiya Sovyetê.

Her çend Frieda ji bo berjewendiya kesên din gelek dixebitî jî, gelek caran zehmetiyan dikişand ku li ser lingên xwe bisekine û ji xwe re cîh çêbike . Ew di hin têkiliyên kesane de bûye sîwanek ku ji hezkiriyên xwe re xizmet dike lê armanc û hewcedariyên xwe qîmetê nade an pêşane neda . Ev tê wê wateyê ku carinan wî pêşveçûna xwe asteng dike.

Di salên pêş Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, Frieda bi baldarî bala xwe dayê ka rewşa siyasî çawa pêşdikeve , û ji ber vê yekê wê pir zû pê hesiya ku rêveberiya Nazî dê bilez sansûr , kontrol, hêza leşkerî, û şopandina Cihûyan û yên din zêde bike. komên marjînal di salên pêş de. Li şûna ku mîna piraniya li Hollandayê xemsar be, ji destpêkê ve li ber xwe da. Da ku nirxên wê diyar bûn û li gorî wan dijiya , ji bo ku tevî Berxwedana Serdemê bibe gelekî gelemper bû û wiha got: “Ez mirovên ku tenê ji bo xwe dijîn fam nakim. Ez nikarim vê yekê fêhm bikim. Hûn şadbûna xwe ji ku distînin? Hûn razîbûna xwe ji ku distînin? Bi jiyana xwe çî dikin?”



Wekî ku wî di destpêka dagirkirinê de di sala 1940-an de pêşbînî ku kontrola Naziyan zêde bibe dê were vê wateyê ku ew ê muzîkjenên Yahudî ji kar derxe . Wê nexwest ku vê yekê bike û li şûna wê orkestraya ku wê rêberî dikir, ji zû de betal kir . Digel ku piraniya cîhana huner û çandê bi nermî li gorî daxwazên dagirkeran tevdiageriya , Frieda ji vê lihevhatina faşizma vekirî ya mezin hêrs bû. Frieda tevli koma berxwedanê bû ku Gerrit ven der Veen û Willem Arondeus jî di nav de bûn . Bi hin hunermendên din re li ser sextekirina nasnameyan dest bi xebatê kir. Di heman demê de piştgirîya aborî ji hunermendên ku red kirin înzekirina bi navê "Daxuyaniya Aryen " ( daxuyaniyek ku tê de tê gotin ku ew kes ne Yahudî ye , ev danezan jî bo nîşankirin , derxistin û darizandina nifûsa Yahudîyan hatine bikar anîn) zêde kir. Bi hev re, Frieda û Frans Duwaer nêzîkî 70,000 nasnameyên sexte çêkirin. Ne ji ber nasnameya xwe ya zayendî, ji ber xebata xwe ya di berxwedanê de ketibû ber çavên Naziyan.

Di sala 1943'an de ji bo koma berxwedanê hat fêmkirin ku êdî bi tenê sextekirina nasnameyan têrê nake. Naziyan di serjimêriya Amsterdamê de bi rêkûpêk dest bi kontrolkirina derbasdariya nasnameyan kirin (kopiyên hemî nasnameyên fermî hatin girtin ), da ku ew bi hêsanî nasnameyên sexte nas bikin . Koma berxwedanê ya çareseriyê bû û ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê plansaziya teqandina buroya nifûsê hate çêkirin . Çalakiyên sabotajê bi ser ketin , di serjimêrê de zêdetirî 800 hezar nasname bi temamî hatin rûxandin . Frîda di plansazkirina çalakiyê de bi awayekî aktîf cih girt, lê ji ber ku rêhevalên wê weke "karê mêran " dîtîn, destûr nehat dayîn ku şeva çalakiyê tevli bibe.

Demeke kin piştî sabotajê , piranî komê ji ber xayînekê hatin girtin Frieda bi reviyane Swîsreyê xilas şer demeke kin vegeriya Hollandawiyê de koçî Dewletên Yekbû kir . Derbarê serpêhatiya xwe Holendayê de , wî got : “ Xerî Yahudîyan ku ji kampan vegeherî milk û pereyên wan tunebû , nîrxemgînî û bêhêvîtiya wan neke jiyana xwe xistine metirsiyê jî ne Ew tunebûn . Qay hevalên min , mirine. Mîna serşokeke pir sar bi ji nû ve dest bi kariyera xwe kirî serkeşa orkestra . Di sala 1995 nexweşiya pençeşêrê jiyana xwe j

Frieda bi eşkereyî ji bo hevalên şer nekir, lê çîroka jiyana wê, beşek ya di dema şer de beşek ji di şoreşgerî ya LGBTI + ye . ' lezbiyenek , bi astengiyan re rîdîsa jî berxwe da. Berxwedana dide ku beşdarbûna LGBTI çekdarî de ne tiştêkî nû ye, ten niha dora me ye ku em vê eşker ku gelek LGBTI + li ber nîbidomînin.







# Richard/Lola (Valerio Mante Jr)

1950 - 22.09.2008


Rêheval Richard ku bi navê Lola jî tê nasîn, zêdetirî 10 salan weke têkoşerek komunîst a hevzayend xwe avêt himbêza şoreşa gel. Ew yek ji rêberên pêşeng ên Artêşa Gel a Nû (NPA) bû, ku li başûrê Mindanaoyê li dijî hêzên zordar têkoşîna gundî û xwecihyan girt. Rêheval Richard pêşî dest bi rêxistinbûnê kir, berî ku qanûna leşkerî di sala 1972 de li Filîpînan were ragihandin, ew di wê demê de bi riya dêrê xwe çalak bû. Dûv re ew tevî Khi Rho, rêxistinek girseyî ya gundiyan bû. Salek di girtûgehê de ma, piştî serbestberdana xwe yekser çalakiyên xwe bi organîzekirina meşên li dijî zevtkirina axê li bajarê Davao berdewam kir. Di salên 1990î de beşek ji Koalîsyona Rizgarkirina Deynê bû. Ew ji 1996 heta 1998 serokê Bagong Alyansang Makabayan li başûrê Mindanao bû. Gelek caran di warê propagandayê de dixebitî û tékiliyên nêzîk bi medyayê re hebû, her tim bersivên rast, rasterast û bi rêk û pêk dida pirsên ku jê re dihatin kirin.

Ew di 47 saliya xwe de tevî NPA bû. Rêheval Rîçard li çiyayan, di nav rêhevalên xwe û cotkaran de cih û şahiya xwe dît. Hin heval û mervên wî ji ber tîrsa ku temenê wî ji jiyana gerîlatiyê re mezin bûye li dijî biryara tevlibûnê derketin. Wê di rojnivîska xwe de wiha nivîsibû: "Di lûtkeya çalakiya xwe de, min biryar da ku ez beşdarî NPA bibim. Ev biryar di derdora min a nêzîk de bû sedema bertekên cuda. Hinek kêfxweş bûn, hinek jî bi guman bûn. Vê yekê bandor li biryara min nekir. Berhema têkoşîneke dirêj û bi êş a li dijî xwepereştî, ferdpereştî û serbilindiyê bû. Min dev ji jiyaneke rehet berda, malbat û mervên xwe terikand û ji hevalên xwe yên nêzîk reviyam. Ew biryara herî dijwar lê çêtirîn bû ku min di jiyana xwe de girtiye." Destûr neda ku temen piştî wê bigire, hilkişiya çiyayan û îsrar kir ku bi girseyan re xebata xwe bidomîne, serdana cihên herî dûr bike.

Rêheval Richard hevzayendekî birûmet bû û gelek vetûrî şikand. Nehîşt ku nasnameya xwe bi têkoşîna çekdarî ji gelê xwe re bike asteng û bi vê yekê îlham da kesên din. Zewaca wî yekem zewaca fermî ya hevzayendan bû li herêmê. Ji bo piştgiriya perwerdehiya hevalên xwe û pêşxistina xwendin û nivîsandinê bênavber dixebitî. Di heman demê de helbestvan bû û li ser gundî û karkerên cotkaran nivîsand.

Ji xebat û pirsgerêkên gundiyan re rezdariyeke mezin nîşan da. Wî girîngiya bêhempa ya Marksîzm-Lenînîzm-Maoîzm dît, nemaze ji bo axa û cotkarên ku bi destwerdana hukûmetê re di nav nakokiyek domdar de bûn. Wî dikaribû nîqaşên rewşenbîrî bi peyvên sade derxîne, wan bi hêsanî ji girseyan re bide famkirin. Di ser de jî, wî, ne bi zorê, bi mînakbûn rêbertî kir. Ew perwerdekarê partiyê bû û di kampanyaya bîrdozî ya partiyê de kedeker giranbuha da. Heval Rîçard guhdarekî bi sebir bû, li ser xweşiya rêhevalên xwe disekiniya, bi taybetî yên kumêjiya wan tevlihev dibû, di nîqaşa bi rêheval Rîçard re rihetiyê didît. Sama Sulong, seroka civakê li herêma Rêheval Richard/Lola, got ku ew ê her tim wekî "inahan sa tanang inahan (dayika hemû dayikan)" were bibîranîn. "Lola wek zarokên xwe yên rast bi me re nêz bû. Dapîra gelê Lumad... lehengê bindestan"

Di Îlona 2008'an de rêheval Richard di 57 saliya xwe de ji ber enfeksiyona xwînê ku bû sedema kêmbûna gurçikan, nemir bû. Hefteyek bû nexweş ketibû, lê nedixwest ku hevalên wî, zehmetî bikşinin û wî bibin nexweşxanê. Piştî hewildanên dûr û dirêj ên hevalên wî, di dawiyê de ew razî kirin ku bila wî bibin nexweşxaneyê. Piştî ku hevalên wî ji çiyê anîn 14 saetan li nexweşxaneyê nemir bû. Di nav nivîna mirinê de jî ew kes bû ku moral û motîvasyona rêhevalên xwe bilind dikir û henekên xwe bi wan dikir.



# Purga (Alvin Rey Santiago)

02.11.1990 – 11.08.2011

Purga di 2-ê Mijdara 1990-an de li Fîlîpînan di malbatek çîna navîn a jêrîn de hate dinê. Wî li Mindanaoyê xwend , li wir bû milîtan , bi girseyan re têkildar bû û di dawiyê de bû xwendekarek pêşeng. Di dawiya salên 2000-an de, wî xwe ji hêla îdeolojîk ve bêtir pêş xist. Bi çavê Marksîzm-Lenînîzmê fêrî analizkirina şert û mercên gelê xwe û zordestiya sîstematîk û şert û mercên taybetî yên komên cuda bû. Di havîna 2010 de tevî Artêşa Gel a Nû (NPA) bû .

Çawa ku rêhevalê wî Moses nivîsibû, "Jiyana Alvîn ji bo kesên ku ew nas dikirin , dibe ku karekî îroniyên ecêb bû. Di gelek waran de ew nîşaneya çîna jêrîn, bûrjûwaziya biçûk bû, ku ji bo têkbirina bermahiyên çîna xwe yên ku ketin nav tevgera neteweyî ya demokratîk têdikoşin. Digel ku ew gelek caran neçar mabû ku êşên birçîbûnê bikişîne da ku hefteyek pereyê xwe yê hindik berdêl bike, ew kesek bû ku pêlavên pêpên bilind, 6 inç bilind, ku ew ê tenê carekê li xwe bike, her çiqas ji ukay-ukay hatiye dizîn." Moses lê zêde dike, "bîra wî ya gotinên stranên pêşkeftî û şoreşgerî tenê dikare bi hostatiya wî ya stranên hit ên Mariah Carey re hevrik bike. Purga di dema civînên de ji bo nermkirina tansiyonên bi mîzahiya xwe hez dikir, carinan dihat dîtîn ku bi hevalên xwe re li ser mijarên herî piçûk nîqaş dike. Ji min re hat gotin ku ew yek ji pêşengên 'vekirî' yên Pi Sigma Fellowship \* ye û bi tundî kampanyayê dide da ku endamên civaka LGBTQ di nav biratiyê de birêxistin bike."

Dem a rêheval Purga tevî gerîla bû , perwerdeya xwe ya berê baş bi kar anî. Beşdarî bernameya xwende-nivîsendetiyê ya sendîkaya xwe bû , di sparteke de alîkariya zarokên gundiyan kir, dersa tenduristî û xwarinê da hevalên xwe. Di partiyê de perwerdeya bijîşkiyê dît. Di heman demê de têkoşîna xwe ya siyasî û îdeolojîk bi lêkolîna teorîk û ya herî girîng jî ji girseyan hîn bû, bi pêş xist. Ji hevalên xwe re bû rêberekî siyasî û bal kişand ser pêwîstiya belavkirina şîroveyan Marksîzm -Lenînîzm - Maoîzmê yên li berdestî li girseyên gundî û proleter û hevalên nû, hem jî li ser şerê şoreşgerî .

Rêheval Purga di sibeha 11'ê Tebaxa 2011'an de nemir bû. Yekîneya wî li Davao Oriental , li Cateel kemînê da leşkerên dewletê. Ji sînga xwe gule xwar. Hevalên wî çend kîlometre dûrî eniya şer dema ji dijmin paşve diçû termê xwe weşartin . Çend roj şûnde dijmin cihê gora wî koland û wek propagandaya dewletê termê wî derxist.

Rêheval Purga di pratîka xwe ya rojane de nîşan da ku gerîla dikare bi gelek awayên cuda derkeve holê. Gerîla ne tenê zîlamên na-trans bi ruyê dijwar in. Gerîla jî stranên civakî, kêfî, pop, gayên nazîk û bi pêpên bilind in. Bi dilsozî, evîn û ken têkoşîya. Rêbertî da me, îmkanên li pêşîya me nîşanî me da, niha jî li ser milê me ye ku em ji cihê ku lê hiştibin bidomînin û di bîranîna wî de têkoşîna xwe xurt bikin.

\*Pi Sigma Fellowship (ΠΣ) biratiyek civakî-siyasî ye ku bi prensîbên "Paglingkuran ang Sambayanan (Xizmeta Gel) û Paragona Scholarship" digire. Endamên wê ji xwe re dibêjin Paragon. Di 15-ê Tebaxê, 1972-an de, Quezon City ji hêla heşt ciwanên ku li Zanîngeha Fîlîpînan Diliman's Molave Dormitory civiyan, hate damezrandin.





# Avaşîn Tekoşîn Güneş (Ivana Hoffman)

01.09.1995 – 07.03.2015

Avaşîn di 1'ê Îlona 1995 'an de li bajarê Emmerich ê Elmanyayê ji dayik bû. Bavê wê koçberê Togoyî û diya wê karkerek Alman bû. Ji biçûkatiya xwe de xwediyê kesayetiyê civakî bû. Ew zû xwe bi hawîrdorên ku ew ketibû adapte bû. Malbateke wê ya kedkar bû, li taxên ku koçber û karker lê dijîn mezin bû. Li vir pêwendiyê taybet bi koçberên ji neteweya kurd re datîne. Xwişka wê ya mezin di hevpeyvîna ku piştî şhadeta Avaşîn kirî de got ku ew kesekî reben, xirxirok û bi hêrs e. Ji biçûkatiya xwe de eleqeyê mezin bi futbolê re hebû û di tîmên futbolê yên herêmî de dilîst. Avaşîn her ku polîtîze bû, cewherê wê ye hêrsbûyî karakterekî şoreşgerî girt. Têkiliyên civakî yên ku bi Kurdan re danî, di polîtîkbûna wî de cihê girîng girt. Di sala 2011 'an de rêxistina ciwanan a bi navê Têkoşîna Ciwan nas kir. Di heman salê de, protestoyên xwendekaran li Elmanyayê pir gelemperî bûn. Avaşîn li vir jî roleke aktîf lîst. Tecrûbeyên ku di van çalakiyan de bi dest xistin, rêyê nû da helwesta wê ya siyasî. Di heman demê de heyrana gerîlayên jin ên li Kurdistanê şer dikin. Di sala 2012 'an de tevli refên Rêxistina Ciwanên Komunîst (KGÖ), rêxistina ciwanan a Partiya Marksîst Lenînîst Komunîst (MLKP) bû. Di salên paşerojê de jî beşdarî gelek çalakiyên antî-faşîst, ablûqe û çalakiyên piştevaniya bi gelê Kurd re bû.

Wek lezbiyênêk, têkiliya wê ya taybet bi tevgera LGBTI+ re nebû. Heman pirsgerêkên wê yên ku gelek jinên ciwan hebûn. Digel kesayeta xwe ya civakî, di civînên ku beşdar dibû di axaftinê de zehmetiyên dikîşand. Ji bilî kesayetiya xwe ya şerxwaz, şermok jî hebû. Dayika wê diyar kir ku Avaşîn di têkiliyên xwe yên bi jinan re rola mêran dilîze. Lê hevalên wê

diyar kirin ku bi nîqaş û perwerdeya ku di çalakiya şoreşgerî de dîtiye ev aliyên wê hatine guhertin. Avaşîn gav bi gav li ser bêalîbûna xwe û taybetmendiyên din ên reaksiyonê derbas dibû. Dema ku xebatên xwe yên di nava MLKP'ê de didomand, xwest ku di demeke herî nêz de tevli têkoşîna gerîla bibe. Xwişka wê ya mezin jî got, "Nexwest bibe mîna keçên derdora xwe. Ji ber vê yekê di 15-16 saliya xwe de dest bi kincên mêraniyê kir. Dixwest bi cil û bergên xwe baweriya xwe bi xwe zêde bike." Bi saya polîtîkbûna xwe jina azad ku di zarokatî û azebîya xwe de lê geriyabû kifş kir.

Wek jineke lezbiyênî ya Afro-Alman, ji şoreşgerên Kurd û Tirk re ne xerîb bû. Hewl dida ku bi awayekî ji pirsgerêka ziman derbasbike. Piştî ku tevli gerîla bû jî ev hewldan berdewam kirin. Çend caran çûye Stenbolê û li wir beşdarî xebatên partiya xwe bûye. Di pirtûka bi navê "Şervanê Navneteweyî ya Hêvi" ya ku ji bo bîranîna wê hatiye nivîsandin de wiha got: "Ji bo Ivana temaşekirina rêzefilmên Tirkî an jî bi dendikê di destê wê de li muzîka kurdî guhdarîkirina li ku malbatên wê serdana wan dikir, dîtineke hevpar bû. Têkildariya bi her tiştê ku bi Kurdistanê ve bala wê dikşand, bi taybetî jî têkoşîna gerîlayên jin ên Kurd. Demeke dirêj xwe weke 'Mardîni' da naskirin. Taybetî û cudahiya bajarên Kurdistanê dizanibû. Dema Îvana di Newrozê de dîlanê digirt, kesî nikaribû li cihê xwe bisekine. Bi taybetî dema ku wê dest bi bazdana nav dîlanê kir, her kesî dest bi ken û çepikan kir." wek wiha tê gotin.

Piştî daxwaza wî ya tevlibûna gerîla , demek dirêj û dijwar ya bendewar derbas kir. Avaşîn di Nîsana 2014'an de, beriya îmtîhana lîseyê dest ji dibistanê berda, nameyek xatirxwestinê ji dayika xwe re nivîsand û di demeke kurt de berê xwe da çiyayên Kurdistanê . Ji bo wî, rêwîtiya jiyana xwe ya nû bi vê gavê dest pê kir.

Bi dilxwazî xwest ku hînî lêkolînên siyasî û leşkerî bibe, bi taybetî jî bi biryar bû ku li çekên Kalashnikov û BKC bibe pîspor . Di heman demê de, armanca wî perwerde girtina siyasî-îdeolojîk bû. Dixwest stratejî û taktîkên partiya xwe fam bike. Ji bo perwerdeya xwe zû dest bi hînbûna tirkî kir.

Di adaptasyona jiyana gerîla de pirsgrêkên wî hebûn. Lêbelê, wî gilî li ser vê yekê nekir. Di heman pirtûkê de pêvajoya ku li çiyayan jiyaye bi gotina "Li çiyayan dibe ku aliyên zehmet ên jiyana kolektîf hebin . Bi taybetî jî rexne û rexnedayîne di pêşketina kesayetî de roleke diyarker dilîze û beşek ji perwerdeya bingehîn e." sedemên zehmetiyên Ivana têne vegotin . Têkildarî vê pêvajoyê jî rêhevalekî wî got, " Hevrê Avaşîn dikaribû gelekî aciz bibûya . Bi serhişkî hewl dida ku sedemên rexneyan hîn bibe . Ev tevger dikaribû bibe sedem ku rexnedayîna xwe xurtir bida . Lê divê ku wê razî bikira . Di rewşên îqnakirinê de kêliyên tengezarî hebûn ." Jiyana gerîla zehmetiyên hestiyar bi xwe re tîne . Ev awayê azadiya bêşînor jî veqetîna ji mirovên ku hûn jê hez dikin ferz dike. Di pirtûkê de tê gotin ku Avaşîn gelek li ser malbata xwe difikire , bêriya heval , rêhevalên xwe û bi taybetî jî diya xwe dike . Paşê derbasî Rojava bû û bi lez û bez xwe bi jiyana xwe ya nû li wir bi cih kir. Li eniya Til Temir a li dijî DAIŞ 'ê cihê xwe girt. Dema li gundê Til Nesrî li vir bi cih bû di encama êrîşa çeteyan de nemir bû.

Di pirtûka li ser pevçûna dawî ya ku Avaşîn di şeva 7'ê Adara 2015'an de nemir bû de wiha tê gotin: "Dijmin destpêkê êrîşî gundê cîran û piştê jî gundê Til Nesrî kir. Di vê saetê de Ivana ku bêhna xwe digirt. , bi hevalên din re ji xew şiyar bû, yekser biksî (PKM an BKC , mîtraloz) çû cihê xwe û xwe ji şer re amade kir . Piştî şerê ku 1-2 saetan dom kir, bi 2 guleyan birîndar bû.

Di vê pevçûnê de rêheval Îvana bi rêheval Coşkun Înce re nemir bû, hevalên wî yên ku pê re şer kirin , piştê vegotin ku çawa bi lehengî şer kiriye." Şervanê YPG'ê Mordem Birhat der barê wê şevê de got, "Hevalên me yên ku heta guleyên xwe yên dawî li ber xwe dan, nehiştin çete derbas bibin. Hevalên me yên ku bi coş û biryardarî li çeperên xwe yên ji aliyê komeke mezin a çeteyan ve hatiye dorpeçkirin, heta guleyên xwe yên dawî li ber xwe dan. ."

Avaşîn li şûna ku jiyaneke rehet bijî, tercîh kir ku li Rojava bi têkoşînê nemir bibe . Wek şoreşgerekî ku ji paşverûtî, kêmasî û xeletiyên xwe serî netewand jiya û nemir bû. Nasnameya wê ya lezbiyenî ji aliyê derdorên cuda û bi hincetên cuda ve hat veşartin. Lê pratîka wî ya şoreşgerî bi nameya ku nivîsandibû di dîrokê de hat qeydkirin: "Êdî ez nikarim rengên xweşik ji hev cuda bikim, bayê bajêr li ser çermê xwe hîs nakim . Qîrîna çivîkan ji min re mîna bangeke xurtir a azadiyê ye. Min biryarek girt, bi rojan bi van ramanan jiyam. Niha ew roj e ku ez bi îradeya xwe bi qasî ava çemê Dicle û Firatê gavekê bavêjim . Ez dixwazim bibim parçeyek ji şoreşa Rojava , li wir xwe pêş bixim, têkoşîna me ya ku hemû gelên me yên bindest dike yek nas bikim . Di serî de ger hewce bike ez dixwazim bi canê xwe şoreşê biparêzim . Ez dizanim ku di encama vê de dibe ku ez bi çi rû bi rû bim û ez bi girîngiya vê têkoşînê dizanim. Helbet ez ê zehmetiyê bikişînim û bibînim ku ez xwediyê kîjan taybetmendiyên bûrjûwazî me. Lê ez li dijî wan hemûyan şer bikim . Ezê bijîm ku hîs kirina ji bo şoreşê bi çeka xwe şer kirin, li dijî emperyalîzmê şer kirin çawa ye. Ez ê jiyane ji aliyên cuda hîs bikim û bi hestên sifitir bijîm. Ez ê her tim sînorên xwe derbas bikim , li hember îhtîmala paşve ketine ji ez ê dev ji rihê xwe yê têkoşînê bernedim."





# Joaquin/Waquin (Wendell M. Gumban)

22.09.1985 - 23.07.2016

Rêheval Waquin di sala 1985'an de li Filîpînê di malbateke biçûk-bûrjûwazî de homoseksuelek bû. Ew dilgeş, kedkar, mahînhîn (jinane) xwendevanek dilşewat, bi nerm ziman û kêfxweş bû. Bi baweriyê kar dikir. Wê ji çenteyên binefsî û şemsiya sîwanên kulîlkan hez dikir. Dema ku li zanîngehê bû, ew di sala 2003 -an de beşdarî tevgera neteweyî ya demokratîk li Diliman bû, pêşî di Yekîtiya Xwendekarên Filîpînî de ji ber ku ew li dijî bazirganîkirina perwerdehiyê û polîtîkayên dij-gelî yê serokê wê demê Gloria Macapagal-Arroyo bûn. Di heman demê de wî dixwest ku bi nivîsandina ji bo Koleja Filîpînî xwe îspat bike. Ew saya bi rêxistina xwe ya xwendekaran beşdarî Partiya Komunîst a Filîpînê (CPP) bû. Piştî ku di sazîyan partiyê yê li ser zanîngeh û sendikayan de xebitî, çû herêmên gerîla yê li Mindanao û di sala 2011'an de bû endamê Artêşa Gel a Nû (NPA). Di xebatên yekkirina partiyê de li baregehên Sor û berfirekirina li herêma gerîla bûye beşeke hêja. Weke mamosteyê siyasî yê yekîneyeke NPA, di berfirekirina yekîneyên gerîla û yekbûna siyasî ya şervanên Sor de cih girt.

Marya Salamat di gotara xwe ya bi sernavê " Lehengek bi navê Wanda " de wiha dinivîse : " Weke komunîst, Ka Waquin têdikoşiya ku bi eslê xwe yê biçûk-bûrjûwazî û jiyaneke sade û rihê têkoşer bijî. Ji bo xizmeta Lumads û gundiyan li başûrê Mindanao, neçar bû ku xwe bispêre laşê xwe yê qels, çavê nebaş. û tewra sînorkirinên ku ji hêla zaravayek ku wî nedizaniyê derbas kir. Jîrî û wêrek, Ka Waquin çavkaniya îlhama ji ciwanên rewşenbîr re. Wî di nav dilê şerê gel de jiyaneke bi fedakar û xwe bexş hilbijart ne jiyana rehet a ku bi awayekî din dikaribû bimeşanda."

Ji rojên xwe yê rêxistinbûyî xwendekaran heta rojên xwe yê li herêmên gerîla yê Mindanaoyê, di nava tevger û partiyê de zehmetiyên hevzayendî niqaş kir. Wê bi gotina " Wanda (nasnavê wê) jî azad bibe" eşkere kir ku pêwîstî bi dîtina azadiya hevzayendan û LGBTI + bi giştî ji têkoşîna çînan re ye. Rêheval Waquin weke gerîlayekî di xurtkirina têkiliya gerîla û gel de gelekî baş bû. Wî alîkariya analîzkirina pirsgirêkên ku gel ji NPA re anîbûn kir û bi şanoya gel û niqaşên propagandaya giştî kir.

Rêheval Waquin bi rêheval Glen (Sario Mabanding) re di 23'ê Tîrmeha 2016'an de, di pevçûneke bi leşkerên hikûmetê re li Geliyê Compostela, nemir bû. Sekretera Giştî Renato Reyes Jr., di axaftina xwe ya li merasîma bîranînê ya rêheval Waquin de diyar kir ku şoreşger bi ti awayî şer naxwazin û wiha dewam kir, "Ew dizanin ku tenê bi şer dikarin şerê navbera çînan biqedînin. "Heya ku xelk êdî di navbera çînan ku kesên din mêtînger dikin û hewl didin tepeserkirina yê din bikin daku mêtînger kirina wan berdewam bikin de dabeş nebe, xelk dê di şer de bin," got. Li ser gotina Mao Zedong, "Qanûnên şerê şoreşgerî ji xwesteka bidawîkirina hemû şeran derdikevin", wî destnîşan kir ku şoreşgerên mîna Wendell bi rastî jî xwesteka herî dijwar bûn ku bigihîjin aştîyê û bi rastî di jiyana gel de guhertinan pêk bînin.







# Hêlîn Qereçox (Anna Campbell)

1991 – 15.03.2015

Hêlîn di sala 1991 ê de li Îngilistanê ji dayik bûye. Ew zarokekî ku li dinyayê meraq dikir û ji pirtûkan hez dikir bû. Ew keça muzîkjenek bû. Diya wê kesekî siyasî yê çalak û xwedî hesta edaletê bû, li bajarê ku lê dijiyan beşdarî çalakiyên mafdar bû. Hêlîn ev yek ji biçûkatiya xwe de mînak girt. Li zanîngeha Sheffield dest bi Îngilîzî kir lê neqedand. Dema ku diçû zanîngehê, beşdarî çalakiyên xwendekaran bû, bi awayekî aktîf di dagirkirina zanîngehê de cih girt û zêdetir tevî fikrên antî-faşîst û antî kapîtalîst bû. Dema ku wê dev ji zanîngehê berda dest bi karekî ambûrsaz kir û çû Bristolê. Li vir jî têkiliyên wê yên bi şoreşgeran re berdewam kir. Ji bo xebatên siyasî yên wekî girtina girtîgehan, dagirkirinan, piştgirîdayîna kesên bê kaxez ên li Ewropayê digerin, li dijî nêçîra çalakiyên sabotajê û antî-faşîzmê kir.

Lê belê, nexwest bi van sînardar bimîne. Di Gulana 2017'an de ji bo tevî YPJ'ê bibe hat vê derê û tevî şoreşa Rojava ya ku tê meşandin bibe. Dema cara ewil hat Rojava li Dêrikê fêrî kurdî bû û piştî perwerdeya leşkerî dît. Der barê biryara xwe ya tevlibûna şoreşê û têkoşîna çekdarî de wiha şîrove kir: "Ji ber ku min xwest ez piştgiriya bidim şoreşê ez tevî bûm. Û ji ber ku min xwest tevî şoreşa jinê ya ku li vir tê avakirin bibim tevî bûm. Min jî xwest li dijî hêzên faşîzmê û dijminên şoreşê tevî têkoşîna çekdarî bibim û şer bikim." Li gel zehmetiyên ku weke lezbiyenek li Rojava rû bi rû maye jî, dilsoziya wê ya bi şoreşê re xurt bû û wiha got: "Helbet ez li vir im, çawa dikarim li cihekî din bim?"

